


“Baranê bibar bibar.

Çivîka genimê te xwar.

Qijalikê li te kir hewar.

Sêwîka serê hev xwar.”





ARA
ZAROK

Kovareka perwerdeyî,
zanistî û çandî ya zarokan e.
Yek ji berhemên Ararat Groupê ye.



Silav hevalên min!

Ara Zarok; mala we ye, warê hêvî û xewnan e.
Kovara me rêya zanist, perwerde û çanda kurdî ye.
Pencereya cîhana zarokan e.

Hem dibistan, hem jî xemrevîna we ye!

Zivistan e; sir û sermaya şevan xwe lî me pêçaye!

Em ê bi gotin û beşen xwe we dîlgerm bikin.

Jî vebûna dibistanê û werzê wê gê duyê heya bi Tîrê em we digerînin.

Bî Arayê ra hûn ê bibin geştyarinên serwext.

Ara Zarok; çêja jîgîna zarokên Kurdan e!

Ara Zarok

- Birêveberîya kovarê: Sîlêman Osman
- Sernivîser û Sererastker: Raman Hesê
- Nîgar: Nêçîrvan Ehmed
- Dîzayin: Hesan Mihemed
Mihemed Osman

Sponsera çapkirinê:
Weşanxaneya Şîlêrê.



© Hemû maf parastî ne.
www.arasat.online/zarok



Zende
Pişka ku berê
şer bû!



Hevalên Arayê
Koma Şanogê

34

Şîernasî
Tîr

26

30
Pêşeng
Deham Ebdufettah

32



هەزىمە

36

Qewêti
Dibistan

38

Saz û awaz
Gitar

24
اللغة العربية



Mişk

"Mişko mişkê terîreş
Li hindir bûye keleş



Didirîne, qul dike
Malî xistin qaqa reş



Mişkê binê neqebê
Xwe avêt bin mekebê



Kışya nav beroşa şîr
Nazê rahişt lewlebê

Mışko da nav savarê
Ji wir jî çû kewarê



Nazê kire qijewîj
Pisîk hate hewarê."

Dema sala me zuha be, berf û baran kêm bibare, ceh û genim jî tînan
biçilmise, gul û gîya melûl bibe, em “Bûka Baranê” çê dîkin.

Em darekî bi dirêjahîya metrojekî tînin, em darekê din jî bi dirêjahîya
nîvmetroyî li ser datînin ku dîbin mîna bedena mirovan.

Kiras û xeftanekî lê dîkin, serê wî bi hibirî û çarikan girê didin û dibe
weke keçikeka xemilandî, em jî çakêt û qutikên xwe ters li xwe dîkin û li
nav gund an jî bajaran dîgerin û dibêjin:

“Bûk baran, Bûk baran.

Me ji Xwedê baran divê.

Bûka me savar divê.

Golika me gîya divê.

Melê me zîka divê.

Kalê me gopal divê.

Pîra me şekal divê.

Xortê me destmal divê.

Qîza me xirxal divê.

Me bi xwe genimê sor divê.”



Em keç û kur tev bi hev ra dimeşin, bûka me li ser destê yekî/ê ji me ye, li
çepikan dixin, mal bi mal digerin û distirînin.

Wexta kevanîyên malan me dibînin; savar, ard, rûn, şekir û nan didin me
û avê bi ser me dadîkin û lava dîkin ku lawij û xwestekên me bi cih bêñ.

Paşê wexta pizrûkên baranê li ser hinarakêñ me dibarin,
em şad dibin û dibêjin:



“Baranê bibar bibar.
Çivîka genimê te xwar.
Qijalikê li te kir hewar.
Sêwîka serê hev xwar.”


Piştî vê stranê baran xurt dibare, em dikevin malên xwe û li ber sobeyê
çaya germ vedixwin da ku nexweş nekevin û vê stranê dibêjin:




“Baranê dayê dayê.
Bû reqreqa tavayê.
Derpîyê pîrê qetiyayê.
Li serê kalo geriyayê.
Pîrê revîya quncikê.
Kalo ma li ber şirikê.
Pîrê çû ber tifikê.
Kalo girtî bi 'incikê.”




Hevalino! Werin em kurmancîya xwe xurttir bikin.




Alpaka



Beq



Cewrik



Çeqel




Dûpişk



'Elok



Çelek



Fil



Ga




Hesp



Pisik



Dîk





SuDoku


Sudoku lîstikek e ji neh çargoşeyên 3×3 'ê yên mezin û heştê û yek çargoşeyên 9×9 'ê yên piçûk pêk tê.

Lîstik bi çend çargoşeyên piçûk ku hejmar tê da hene dest pê dike.

Îê divê lîstikvan hejmaran ji 1'ê heya bi 9'ê bê dubare tê bixe çargoşeyekê ji her neh çargoşeyên mezin bi mercê dî her rêz û bareyekê da hejmarek hebe weke wê ne asoyî û ne jî stûnî hebe.


		8		6	2			
3	7	8	4		9		2	
9	6			7		1	4	
1	2			8	6			
3	4		7	9		2		
6		1			4	3	7	
	1	7	8	4	3			
6	8	5	2		7	4		
4				9	6			1

Ev her pênc hejmarên sor, alîkarîya min e.
Vê carê heye, cara bê ez li bendî bersivên we me!



Ez dixwazim em bi hev ra bikevin pêşbazîyê.

Ka em pazdeh (15) cudahîyan ji vir der bixin
û kî berî kê bi dawî bîne ew ê bi ser bikeve.



Dêwê Pirê



Hebû fine bû.

Sê bizin hebûn, ew bizin
gelek çeleng û wêrek bûn.

Rojekê dînîya pir xweş bû, her sê bizinên çeleng berê xwe dan zozanan. Ew li çayîr, çilo û gîyêñ şîrîn û xweş digerigan ku bixwin.


Di rê da pêrgî robarekî hatin, rabûn çûn kêleka wî. Li alîyê din ê robarê, mîrgeka şîn û gelek xweş hebû.

Li wê mîrgê: gîyayêñ pir teze û biçej hebûn ku wan qet mîna van gîyayan nedîtibû û ne jî xwaribû.

Li ser robarê pirek hebû, lê li bin pirê dêwekê tijî qilêr hebû. Her sê bizin ji dêw tırsıyan ku dema li ser pirê bimeşin dêw der bikeve pêşîya wan, ji ber wî her wext dema dengê rêçûna lingekî li ser pirê dibihîst, baz dîda ser pirê û xwe diavête ser kesen ku dixwestin pirê derbas bikin û li ser bimeşin.

Her sê bizinên wêrek pir ji wî dêwî tijî qilêr dîfîrsıyan. Lê ji alîyê din ve jî dilê wan pir dixwest ku ji wan gîyayêñ xweş ên nav mîrgeka li alîyê din ê robarê jî bixwin. Wextek derbas bû, bizina ciwan got: "Ez dixwazim berî we pirê derbas bikim!"

"Tereq, tiroq, tereq, tiroq" dengê simêñ bizina ciwan a çeleng li ser pirê têbihîstin. Ji nişkan ve serê dêwê tijî qilêr ji kêleka pirê xuya bû, ew gelek gemarî bû. Bizina ciwan nava wê qetiya û dikir dî cih da bimire.





Dêw got: "Ew kî ye lo?! Ew tereq tiroqa li ser pira min a kê ye?"

Bizina ciwan a dîlêr bi dengekê nazîk got: "Ew ez im, bizina piçûk û çeleng. Ez dixwazim herime nav mîrgê, min dîvê gîyayê şîrîn bixwim!"

Dêw îngirî û got: "Hek û sed carî pek!
Va ez ê bêm xwe biavêjîm ser te."

Bizina Ciwan bi dengekê nazîk dîsa got: "Na na! Ji kerema xwe ra nebeze min, ez pir piçûk û bêtam im. Bisekine heya ku xwişka min bizina duyê were. Ew ji min pir bitamfir e!"

Dêw got: "Pir baş e, de tu here, tu xîlas bû!
Ez ê bisekinim heya ku bizina duyê were."

Vêce bizina ciwan pir derbas kir û baz da nav mîrgê ku gîyêñ şîrîn bixwe.

Hingê bizina duyê ya wêrek got: "Dora min hat, ez ê jî pirê derbas bikim."



Dêw got: "Ew kî ye lo?! Ew tereq tiroqa kê ye li ser pira min?"

Bizina duyê bi dengekê nerim got: "Ew ez im, bizina duyê ya çeleng. Ez dixwazim herime nav mîrgê, min dîvê gîyayê şîrîn bixwim!"

"Tereq, tiroq, tereq, tiroq" dengê simêñ
bizina duyê li ser pirê tê bîhistin.

Serê dewê tijî qilêr ji kêleka pirê ve xuya bû. Ew gelek gemarî bû. Bizina duyê jî dîkir ku ji tîrsan bikeve û di cih da bimire.

Dêwbihêrs got: "Hek û sed carî pek!
Va ez ê bêm xwe biavêjîm ser te."

Bizina duyê ya delîr bi dengekê pir nerim got:
"Na na! Ji kerema xwe ra nebeze min, ez ne
gelekî qelew im."

Bisekine heya ku xwişka min bizina sêyê were.
Ew ji min qelewtir û bitamfir e!"



Dêw got: "Pir baş e, de tu jî here, tu xilas bû!
Ez ê bisekinim heta ku bizina sêyê were."

Vêce bizina ciwan pir derbas kir û baz da nav
mêrgê ku gîyayêñ şîrîn bixwe.

Dawîyê, bizina pîr a sêyê hat ku pirê derbas
bike. Ew bizina çeleng gelekî qelew bû. Rûyê
wê jî pir dîréj û şaxêñ wê jî pir gir bûn.

"Tereq, tiroq. Tereq, tiroq. Tep, tap. Tep, tap"
dengê simên bizina pîr a sêyê li ser pirê tê
bihîstin.



Serê dêw ê tijî qilêr ji kêleka pirê ve xuya bû.
Ew gelek gemarî bû. Bizina sêyê nava wê
qetiya, dîkir ku jî tîrsan bikeve avê, lê wê ev
fişt neda xuyakirin. Wê simên xwe hîn giran
û xurttir li pirê dixist. "Tereq, tiroq. Tereq,
tiroq. Tep, tap. Tep, tap".

Dêw 'ingirî û got: "Ew kî ye lo?! Ew tereq
tiroqa li ser pira min a kê ye?"

Bizina pîr a dilêr bi dengekê bilind û qalind ji
dêw ra got: "Ez im, bizina pîr û wêrek."

Dêw 'ingirî û bîhêrs got: "Hek û sed carî pek!
Va ez ê bêm xwe biavêjîm ser te."


Bizina pîr a sêyê got: "Na na! Nebeze û xwe
neavêje min, va ez bixwe hatim ku xwe
biavêjîm ser te." Û gurmegurma simên xwe
xurttir dîkir. "Tereq, tiroq. Tereq, tiroq. Tep,
tap. Tep, tap."

Vêga, bizina pîr û çeleng bi qiloçên xwe yên mezin û gir li dêw xist. Dêwê tijî qilêr, ji ber derba bizina pîr kete nav avê û tê da winda bû, careka din nema kesî rûyê wî yê gemarî dît. Dawîya dêwê qilêrikî li ser destê bizina pîr a çeleng bû. Ji wê demê pê ve, xelk êdî bê tirs pir derbas dikir û diçûn û dihatin. Careka din serê dêw jî kîleka pirê ve xuya nekir û 'ingirî jî kesî ra negot:

"Ew kî ye lo, ew tereq tiroqa li ser pira min a kê ye?"

Her sê bizinêن wêrek jî li mîrgê jîyana xwe bi xweşî domandin. Wan her gîyêن şîrîn dixwar û ti carî birçî neman.


Çiroka min çû dîyaran, xêr û xweşî bibare li guhdaran.





26 Letters
5 Vowels


Hello ! Let's learn the English Alphabet together.




Ant / Mîro



Banana / Moz



Car / Tirimpêl



Door / Derî



Elephant / Fil




Fish / Masî




Goat / Bizin




Hippo / Hespê avê



Iguana / Xorban



Juice / Şirik



Kangaroo / Kangurû



Ladybird / Xalxalok



M
m

Monkey / Meymûn



N
n

Nose / Bêvîl



O
o

Octopus / Heştpê



P
p

Parrot / Tûfî



Q
q

Question / Pîrs



R
r

Rabbit / Keroşik



S
s

Snake / Mar



T
t

Tiger / Pîling



U
u

Umbrella / Sîwan



V
v

Violin / Keman



W
w

Worm / Kurm



X
x

X-ray / Tîşik



Y
y

Yogurt / Mast



Z
z

Zebra / Kerkûvî






Şar Waşûkanî "Serê Kanîyê"

Ji devê: 'Umerê 'Evdikê


Serê Kanîyê; bajarekê Kurdan e, li rojavayî Cizîra Rojavayê Kurdistanê ye. Serê Kanîyê bajarekê kevinar e û dîroka wê vedigere sê hezar û pêncsed sal (3500) berî zayînê. Cara yekê bi destê gelê Sobarto li "Til Helefê" ku 3'km dûrî bajêr e, şaristanî ava bûye û dest pê kiriye. Cara duyê jî Mîtanîyan li rojhîlatî Til Helefê "Waşûkanî" (Til Elfixêrîyê) ava kiriye û jî xwe ra kirine paytext.

Berî dagirkerîyê nêzîkî heştê hezar (80.000) mirov lê dijîyan; şêst ji sedî (60%) ji wan Kurd in, her wiha Ereb, Çeçan, Siryan, Ermen û Êzîdî lê dijîyan.



Li Serê Kanîyê sêsed (300) kanî hene, lê yêner herî naskirî û navdar ev in:

- Kanîya Kurkûtê ('Eyn Kebirît)
- Kanîya Hespan ('Eyn Hisan)
- 'Eyn Banos
- 'Eyn Zerqa





'Eyn Hisan



Taxên Serê Kanîyê

- Mehetê
- Kenîsa
- 'Ebrê
- Xeraba
- Hewarina
- Rêya Hesekê

Taxeck ji bajêr



Til Helef



Dîrok










Jî ber nizimbûna bajêr û ava pir, havîna wê germ û bi nem e, zivistana wê jî sar û bi baran e, lê keldûman ji kanîyên wê der dikeve û hewaya wê germ dîke. Biharan seyrangeh e û mîrgên wê cîhê çêrî û koçeran e.

Wexta Teymûr Leng derbasî Cizîrê bûbû, ev herêma em behsê dîkin çar (4) salan kavil ma. Di salê 1840'ê da (13.000) sêzdeh hezar xaneyên Çeçanên ku ji ber qeyserê Rûsîyayê di dema şoreşa Şêx Şamilî da reviyabûn, Osmanîyan ew anîn Serê Kanîyê, lê ji ber nexweşîyê gelek ji wan mirin û hejmareka hindîk li bajêr man.



Salê 1915'ê, Osmanîyan komkujiya "Sewqat" anî serê Ermenan, ji lew ra zêdeyî milyon (1.000.000) Ermenî reviya Serê Kanîyê. Her wiha di salê 1958'ê da jî hikûmeta Sûrîyeyê gelek xelkên Horanê anî û li bajêr bi cih kir.

Sala 1916'ê, kompanîya Almanî hate herêmê û mîna Kobanîyê êstgeheka tirênenê li bajêr saz kir.



Navdarên Serê Kanîyê

Bêbuhar (Yûsiv Berazî)
Helbestvan

Mizgîn Tahir
Hunermend

Mihemed Ceza'
Nivîskar

Ehmedê 'Ereb (Terîşo)
Listikvanê şanoyê

Mehmûd 'Ezîz Şakir
Hunermend

Hemê Bavê Zêdo
Hunermend

Nûrî Eyûb
Listikvanê bedenşêrê

Mihemed 'Elî Şakir
Hunermend

'Umerê 'Evdîkê
Siyasetmedar



Bersiv vê carê zehmet e!
Gelo tu yê bîbersivînî?

Ka em bi hev ra van mamikan nas bikin.

“Bi şev bûk e,
bi roj pepûk e!”
Ew çi ye?

“Tasa mast,
li dereka rast!”
Ew çi ye?





Ka vê zûgotinokê
sê caran li dû hev bibêje!

- Şîva sofi Sîso şîş in.
- Şîva sofi Sîso şîş in.
- Şîva sofi Sîso şîş in.

Gotinên Pêşîyan

Pendên pêşîyên me her di cihêن xwe da ne; ka em
binihêrin vê carê ci gotine:

"Bi xwezîya,
kes ranaje
kezîya!"

- Her tişta ku mirov bixwaze bigihe wê, gerek e ji bo wê kar û xebatê bike. Ne tenê xwezî û hêvîyan girê bide ku tişta xwestî ji ber xwe ve çê bibe.



طائرة/Balefir



ضفدع/Beq




صياد/Nêçirvan




شمس/Roj



فأر/Mişk



غيمة/Ewir



عنبر/Tirih



ظفر/Neynûk



ملكة/Keybanû



لقلق/Legleg



كلب/Küçik



قطة/Pisik



هدية/Diyarî



نجمة/Stérîk



يقطين/Kundir



وردة/Gul




اللغة العربية


هيا يا أصدقائي فلننتعلم معاً الأحرف العربية




ثور/Ga




تفاح/Sêv



بطة/Qaz




أسد/Şer




ديك/Dik




خبز/Nan




حقيبة/Cente



جزر/Gêzer



ساعة/Demjimér




زيتون/Zeytûn



ريشة/Perik



ذرة/Garis



Tîr, Merkur an jî Zav; yek ji her heşt geresitêrikên Pergala Rojê ye û piçûka wan e. Li gorî rêtê; berî geresitêrika Gelawêjê ye û ya her nêzîkî Rojê ye, lê belê ew heştê û du (82) milyon km dûrî Erdê ye û jê piçûktir e.


Merkur gelekî bilez li dora Rojê digere û di 87.969 rojî da gera xwe digihîne serî. Li Tîrê gelek kunên kûr û fireh hene, her wiha deşta wê şahîk û bêatmosfer e.


Heger hûn bixwazin li ser Tîrê bijîn, wê giranîya laşê we ya li ser Erdê bigihe nîvê giranîyê dema hûn li jora Tîrê bin,

lê hûn ê ji german bimirin, ji ber rêjeya germê li wir digihe 160° rêjeyê, ji ber Tîr gelekî nêzîkî Rojê ye.




Merkur navê Tîrê yê latînî ye, ku di demên berê da ji navê Xwedayê Bazarganîyê yê Romanan hatîye birin.






Zevîyê magnetîzî



Kunên kûr




Heger di dilê me da hebe ku
Tîrê bibînin, ew ê nepêkan
be, ji ber ji Erdê ve nexuya
ye, pê ra jî tenê çend rojan
di salê da xwe dide der.



Babilan navê "Nabu" ku Xwedayê Nivîs û Şarezayê ye lê kir, Yunanan jî jê
ra digot "Stîlvon" (Stîlvon) û "Ermáon" (Hamên), vê dawîyê dema di
berbangê da dixuya; navê "Apollo" (Epolo) lê bû.



Piçika hewayê li geresitêrika Tîrê nîn e!






Tîr bi êvaran gelekî hêdî li dora
xwe digere, ji lew ra wexta dibe
êvar, gelekî sar dibe û qeşa erda
wê digire, ev avhewa dihêle mirov ji
serman bimire!



Keşfiyên gerdûnî yêñ ku gihane Tîrê, gelek agahî li ser dane, dibêjin ku
xazên Hîdrojen û Helyom li wir têñ dîtin.

Gelo te berê Tîr nas dikir?!



Heger te nas dikir;
ji me ra nivîsekê li ser Tîrê bişîne.

Rêya rast bibijêrin û alîkariya
ARA bikin da ku bigihe Tîrê.



Mariner 10 (Marîner) keştiya gerdûnî ya yekê bû ku serdana Tîrê kiriye;
ew sala 1975'ê ji alîyê NASAê ve hatibû şandin.



Deham Ebdulfettah




Zimanî, nivîkar û kurdnas
Deham Ebdulfettah di 01'ê çileya
sala 1942'ê li gundê Bellê ku
girêdayî gundewarên Amûdê ya
Rojavayê Kurdistanê ye hatiye
dingayê.




Xwendina xwe ya seretayî û
navîn li gundewarên Amûdê û
ya amadeyî jî li bajarê Hesekê
qedandîye.

Wî li zanîngeha Helebê beşa
Wêje û Zimanê Erebî xwendiye
û jê der çûye.



Sala 1987'ê dest bi nivîs û xwendina bi zimanê kurdî ya bi tîpêñ latînî kiriye.
Kar û xebateka berfireh di warê werger û rîzimana kurdî-kurmancî da kiriye.

Berhemâ wî ya destpêkê "Li ber dergehêñ Laleş" bi destûra hîkûmeta
Sûrîgeyê bi kurdî û erebî hate çapkirin û du hezar (2000) çap jê
hatin belavkirin; ku ew cara yekê bû hîkûmet destûrê dide pirtûkekê
bi tîpêñ kurdî yêñ latînî were çapkirin.



Li çar parçeyê Kurdistanê geriyaye, çûye Ermenistan, Yewnanistan, Almanîya, Holenda, Romanîya û gelek welatên din.
Heta niha sêzdeh (13) pirtûk çê kirine, ji nêv wan dozdeh (12) pirtûk çap bûne.


Ji wan:

- 1-Destana Gilgamêşî**
- 2-Yarasan an jî Ehlî Heq**
- 3-Nêrîneka rexneyî li helbesta kurdî**
- 4-Hemû çarînên Omer Xeyam**
- 5-Seta ziman (Kar-Nav-Cînav)**
- 6-Hindek alozîyêن zimanê kurdî**


**"Armanca ku bi serê pênûsê negê pelandin,
tu caran ew nakeve ber nişana tivingê!"**

Deham Ebdulfetah 

**Zimanzanê bi tenê ku jî Rojavayê Kurdistanê di nav
komîteya amadekirina pirtûka "Rêbera rastnivîsinê" da
cih girtiye.**




Ênebê حُنْجَر



Sehiro حِصْرَة



Nêşiro نُسْرَة




Medîreşîto حِدْرَسِيَّة




Rîş رِسْكَه



Qenyô حِقْبَلَه




Sêmido حِمْدَه



Fûmo حِفْمَه



Terinuxlo تُورْنُوكَلَه



Şîşwono حِشْوَنَه


حُنْجَر حِفْمَه

سازِيَا ئَلَفْ تَاوْ يَا زِيمَانَه سِيرَانِي


كەنەنە

لە جەھە ئەۋەنە كەنەنە سەھىپىسى

Ta wûlixwûn yulfînan lêşono suryoyo 'amhidodê




Dibo ئۆخا




Gemlo كەنەنە




Bûmo حەمە




Eryo ئۆزى




Himoro سەخىن



Zirnifito ئۆزەفەدا




Wazo چەو




Habobo حەبا




Lûzo كەرە



Kisobo كەنەنە



Yewno كەنەنە



Teyro كەنەنە



Vê carê ez bûm mîvana hevalên xwe yê "Koma Şanoyê".

Dema ez derbaşî odeya wan a provayê bûn, min şanogeha wan a mezin dît!

Ez gelekî şad bûm wexta hevalên min li ser wê lîstikvanî dikirin.

Gava min xwe bi wan da naskirin, gelekî ji min hez kirin û fêrî listikvanîya şanoyê kirim.

Hûn jî herin wir û xwe fêrî şanogerîyê bikin,

ji ber şano hunereka bedew a civakê ye.





Lawîn Ehmed



Xezal İbrahîm



Kazim Ferman



Hîm Umer



Solîn Mihemed



Nûr Umer



Arta Ehmed



Ferhad Umer



Vîn Meşayix





Ev deh roj in ez li malê me.

Min gelekî bêrîya dibistan û Şivanê hevalê xwe kiriye.

Sibe betlaneya me ya werzekî diqede û diçim dibistanê.

Sibeh hat û ez kêfxwes ji xew şîyar bûm, min li ser çavêن xwe şûşit,

bavê min porê min şeh kir, me taştê amade kir û bi hev ra xwar.

Min bawer nedikir kengî ji malê der bikevim û berê xwe bidim dibistanê.

Min cil û bergên xwe li xwe kir, çenteyê xwe da milê
xwe, xatir ji bavê xwe xwest û bi rê ketim, min berê
xwe da mala Şivêن ku pev ra herin.

Ez giham mala wî, ew li devderî li benda min bû.



Wexta Şivanî ez dîtin,
 girnijî û silav li min kir, min jî lê
 vegerand: "Rojbaş Şivan! Min gelekî
 bêrîya te kiribû."
 Şivan gelekî şa bû û di rûyê min da
 kenî û got: "Erê Ara, va ye dîsa
 dibistanê derîyên xwe vekir û çavê
 wê li rêya me ye."



Ez û Şivan bi gavêne bîlez ber bi dibistanê ve çûn û me
 behsa rojêne xwe yêne betlaneyê dikir.

Her ci qasî betlane xweş be,
 dîtina hevalan û çûna dibistanê
 jê xweştir e.

Me pir bêrîya mamotoe û
 waneyêne xwe kiribû.
 Me bêrîya rûniştek, ref, pirtûk
 û defterêne xwe kiribû.

Werzê me bi xweşî dest pê kir,
 hûn jî xwe ji dibistanê ra
 amade bikin.




Gitar



Gitar amûreka mûzîkê ya têlî ye û ji dep tê çêkirin.

Gitar di serdemên Romaya Kevin da peyda bûye, lê
“Antonio de Torres” (Entonîyo Dê Torêş) ê spanî dîzayîneka nû da
gitarê, her wiha ew yek ji amûrên herî kevin e ku ji alîyê mirovan ve
hatiye naskirin, ji ber dî gelek belge û destnivîsên Faris û Romayê da
behsa wê hatiye kirin.




Antonio de Torres



Gitar di heft "7" qonaxan ra derbas bûye
heya ku gihaye teşeyê îro.

Şeş têlên gitarê hene û kîlîta wê ya
kêlekê (dozan) heye.

Piranîya gitaran rengê wan ber bi sor ve ye.
Bi koman ra û bi tena xwe jî lê dikeve.
Li cîhanê herî zêde gitar tê bikaranîn.



Pisîka ku berê şêr bû

Carekê mirovek hebû, ew mirov pisîkeka wî hebû.
 Pisîka wî gelekî jê hez dikir û fêrî bêhina wî bûbû.
 Ew bi ku da biçûya, pisîka wî dida dû û pê ra diçû.
 Carekê vî mirovî balta xwe girt û berê xwe da daristanê ku li
 wir darinan bibire û bîne. Pisîka wî jî pê ra çû.



“Wax! Ev gi teba ye?! Tam weke
 min e ha; lepêñ wê mîna lepêñ min
 in, serê wê jî nola serê min hûr
 e!!!!”

"Hoy tu, erê tu! Tu çi qas dişibî min!"

Ser û lepêñ te weke yên min in.
Lê tu çima wilo hûr, jar û piçûk î?"

"Wîññ çavêñ te nebînin, ê ku ez di destê wî da me, ku tu di destê wî da ba, tu yê niha ji min hûrtir ba."



"Çawa! Te got çi? Ka ew mirovê tu behsa wî dikî kanî? Nişanî min bide, ez wî biperitînim."



"Hêêê, ah wa ye, daran dibire."

"Tu çi mirovî lo! Ev piçikoka han di destê te da belengaz bûye, piçûk û jar bûye?"



"EZ mirovekê xurt im!"

"Nexwe xwe amade bike, ez û tu; em ê şer bikin."



“Lepên te hene, ji ber wê tu yê
bihêz bî, ka raweste ez ê jî herim
amûrên xwe bînim.”

“De bila. Ez ê li bendî
te bisekinim.”



“Na! Ez dizanim tu yê birevî.
Were ez lingên te girê bidim, da ku
bi ti deran ve neçî, heya ku ez bêm.”

“De were girê bide!”



“Ka ez destên te jî girê bidim, heye
tu bi destan lingên xwe vekî û herî,
divê destên te jî girê bidim.”





"Hema bera dilê xwe hênik bike.
Li min bixe, li min nexe ez weke te
piçûk nabim!"

"Bes li min bixe! Tu dizanî
eferim ji pisîkê ra, ku xwe
spartiye te û bi te ra ye.
Şêr û tebayên weke min li vê rêya
ku dê li ser bimeşî pir in!
Soz, heger tu dev ji min berdî; em
ê peymanekê pev ra girê bidin, li
rê û daristanan kî li pêş te der
bikeve, ew nêzîkî te nabe!
Em ê bibin birayêñ hev du."





QR'a kovarê



QR'ê scan bike



Li bende be!



Kovarê bixwîne.

**QR'ê bi kamerayêñ telefonêñ xwe scan bikin û kovara
me bi forma PDF'ê daxînin.**

Dê kanala Ara Zarok di nav
rêzekanalêñ Arasatê da be.
Li benda wê bin!

ARA
ZAROK



44

ara
MED PRO
www.arasat.online



Qazî Mihemed 1893-1947



Em hejmara xwe ya duyê di salvegera heftê û şeşê "76" ya ragihandina
Komara Kurdistanê da diweşînin û dîyarî gîyanê serokê komarê Qazî Mihemed û
hevalên wî yêن pakrewan dîkin.

Ara Zarok; çêja jîyîna zarokên Kurdan e!